# Mafên te dema tu li Rêveberîya Polîsan bî




Ji bo gelek kesan zehmet e ku fêm bikin

ka li midûriyeta polîsan çi diqewime.




Heke polîs dixwazin pirsan ji te bikin lê

ji te re alîkarî divê yan jî tu fêm nakî, çêtir e

tu vê ji polîsan re bibêjî.




Polîs dê zanibin ku ji bo kesên hewcedariya



wan bi piştgiriya peywendiyê heye ji bo xwendin

û bersivandina pirsan hinekî zêdetir

wext hewce dike.

## Naverok


| | | |
|---|---|---|
|  | Girtin û birina bo çavdêrîya polîsan | Rêpela 4an |
|  | Bersivandina pirsên polîsan | Rûpelên 5an û 6an |
|  | Daxwaza Salmezinekî Maqûl | Rûpela 7an |
|  | Derbarê girtina xwe de agahdarkirina parêzerekî | Rûpela 8an |
|  | Derbarê girtina xwe de agahdarkirina kesên din | Rûpela 9an |
|  | Heke tu 16 salî yan jî biçûktir ji 16 salî bî yan jî 16 salî yan 17 saliyekî di bin çavdêriya mecbûrî de bî | Rûpelên 10an û 11an |

| | | |
|---|---|---|
|  | Heke tu li ser fermana mehkemeyê hatibî girtin û te tînin rêveberîya polîsan? | Rûpelên 12an û 13an |
|  | Dikarin çiqasî te li rêveberîya polîsan ragirin? | Rûpela 14an |
|  | Li ba bijîşk û hemşîreyan | Rûpela 15an |
|  | Gilîkirin | Rûpela 16an |

## Girtin û birina bo çavdêrîya polîsan



Polîs dê sedema girtina te bibêje.




Polîs dê ji te bipirse ka te fêm kiriye.

Heke tu ti tiştî fêm nekî, divê tu bibêjî "na".

Tenê gava tu fêm bikî bibêje "erê".

## Bersivandina pirsên polîsan



Mafê te heye tu bêdeng bimînî.

Tu **ne** mecbûr î bersiv bidî pirsên polîsan.
**Lê** tu mecbûr î ji wan re van bibêjî–




**navê xwe**




**ciyê ku tu lê dijî**




**dîroka roja jidayîkbûna xwe**



**ciyê jidayikbûna xwe û welatiyê kîjan dewletê yî**

**Heke tu hin ji van nizanî, divê tu polîsan agahdar bikî.**

**Heke tu bersiva pirsên din nedî jî ev ê serê te bi polîsan re nexe belayê.**




Polîs dê ji te re bibêjin ku ew ê hemû tiştên tu dibêjî binivîsin.

Heke tu bixwazî bersiva pirsan bidî, û heke doza te biçe mehkemeyê, tiştên te gotî dikarin wekî delîl bên bikaranîn.

## Daxwaza Salmezinekî Maqûl



Heke ji te re piştgirî bivê, ji polîsan re bibêje "**gazî Salmezinekî Maqûl bike**".

Salmezinên Maqûl ew kes in ku ji te re bibin alîkar da ku tu fêm bikî ka polîs çi dibêjin. Ev belaş e.




Salmezinê/a Maqûl dê alîkariya te bike ku tu bizanî ka çi mafên te hene û çi diqewime.

Gava tu ji pirsên polîsan fêm nekî, salmezin dê ji te re rave bike.

Ew dikare ne tenê tiştên polîs dibêjin her wisa tiştên dikin jî ji te re rave bike.

Salmezinê/a Maqûl nikare şîretan li te bike.




Heke ji te re Salmezinekî Maqûl hewce bike, tu vê nebêjî jî polîs dê gazî yekî bikin.

**Giring e gava tu fêm nekî bibêjî fêm nakî.**

## Derbarê girtina xwe de agahdarkirina parêzerekî




Beriya jêpirsînê jî di nav de, her gav mafê te heye ku tu bi awayekî taybet bi **parêzerekî** re biaxivî. Ev belaş e.

**Parêzer ew kes in ku mafên te diparêzin û alîkariya xweparastina te dikin.**

Gava tu bi parêzer re biaxivî nabe ku Salmezinê/a Maqûl li ba te be.

Heke tu parêzerekî bixwazî divê gava polîs bipirse bibêjî "erê".



Heke parêzerekî te hebe divê tu navê wî ji polîsan re bibêjî. Polîs dê hewlê bidin gazî wî bikin. Ev belaş e.

Heke parêzerekî te tune be divê tu ji polîsan re bibêjî û ew ê ji bo te telefonî parêzerekî bikin.

Polîs wê hewlê bide ku di demeke nêzîk de bi parêzerê te re têkiliyê daynin. Ev belaş e.




Gava polîs bi te re hevpeyvîn bike parêzer dikare di odeyê de be. Ev belaş e.

Dibe ku tu bi parêzer re bi telefonê biaxivî yan jî dibe ku parêzer ji bo dîtina te bê rêveberîya polîsan. Ew biryara vê dide.

Heke tu bi parêzerekî re li ser telefonê axivîbî jî wê cara diduyan ji te bipirsin ka tu dixwazî parêzerek di hevdîtinê de li ba te be yan na.

## Derbarê girtina xwe de agahdarkirina kesên din




Mafê te heye ku tu hin kesan agahdar bikî ku tu li rêveberîya polîsan î.

Polîs dê ji te bipirsin ka tu dixwazî telefonî kê bikin.




Ev dikare kesek ji malbata te, hevjîna/ê te, xwedîkara/ê te, hevaleke/î te yan jî kesekî din be.

Dibe ku destûrê nedin ku tu bi vî kesî re biaxivî.

**Heke tu ji 16 salî biçûktir bî yan jî tu 16 saliyekî yan 17 saliyekî di bin çavdêriya mecbûrî de bî:**



Divê polîs hewlê bidin ku dê û bavê te yan jî weliyê te agahdar bikin ku tu li rêveberîya polîsan î.






Mafê te heye ku dê û bavê te yan jî weliyê te li rêveberîya polîsan serdana te bikin.

Tenê serdana kesên ji 18 salî biçûktir dibe.







**Ji bilî rewşên awarte** divê dema polîs bi te re hevdîtin bikin parêzerek li ba te be.

Wek mînak, heke polîs difikirin li ba te agahî hene ku rê li zirardîtina hin kesan digirin, ew dikarin beriya hatina parêzer pirsan ji te bikin.

Heke tu 16 yan 17 salî û di bin fermaneke çavdêriyê yan jî fermaneke çavdêriyê ya demkî de bî, tu NIKARÎ parêzerekî red bikî.

Di rewşên îstisna de jî mafê te heye neaxivî.

## Heke tu li ser fermana mehkemeyê hatibî girtin û te tînin rêveberîya polîsan?




Heke **doz li te bê vekirin**, dibe ku destûr bidin çûyîna te yan jî li hucreya polîsan bihêyî ragirtin û roja paştir ya guncav herî mehkemeyê.



Heke doz li te bê vekirin polîs dê bixwazin van bigirin:

- **Şopa tiliyên te**



- **Mînakeke DNAyê** (Ew ê darikeke bi pembû bi kubarî di nava devê te de bidin)




- **wêneyê te**



Heke tu li ser **fermaneke girtinê** anîbin rêveberîya polîsan, dibe ku tu li hucreya polîsan bihêyî ragirtin û roja paştir ya guncav te bibin mehkemeyê.

## Dikarin çiqasî te li rêveberîya polîsan ragirin?




Polîs dikarin **bêyî sûcdarkirinekê te heta 12 saetan** ragirin.





Heke tu ji 4 saetan zêdetir bihêyî ragirtin, polîs dê di danên xwarinê de xwarinê bidin te.

Heke tu nikarî hin xwarina bixwî, di wextekî zû de ji polîsan re bibêje.

Heke tî bî ji polîsan re bibêje ku avê bidin te.

Polîs dikarin **tenê bi destûra lêpirsekî polîsan te heta 24 saetan ragirin** (heke ji 18 salî biçûktir bî destûra Sereklêpirs divê).



Mafê te heye ku tu derbarê vê biryarê de gotina xwe bibêjî yan jî tu bixwazî ji dêvla te ve parêzerê te bi polîsan re biaxive.

## Li ba bijîşk û hemşîreyan



Heke tu nexweş yan jî birîndar bî mafê te heye ku tu **doktorekî** yan jî **hemşîreyekê** bibînî.

Heke tu difikirî pêdiviya te bi doktor yan jî hemşîreyekê heye, vê ji polîsan re bibêje.

Heke rewşeke te ya tibî hebe yan jî dermanan bi kar tînî, giring e ku tu vê ji polîsan re bibêjî.



Her wisa heke te madeyeke hişbir yan jî alkol bi kar anîbe yan jî tu difikirî tu yê ziararê bidî xwe, giring e ku tu vê ji polîsan re bibêjî.



**Ev ê ji bo hindê bibe alîkar ku polîs di dema binçavkirinê de hay ji te hebin.**



## Gilîkirin



Mafê te heye ku tu derbarê muameleya polîsan de **giliyê** wan bikî.

Heke tu giliyê Polîsê Îskoçyayê (Scotland) bikî ev ê zirarê nede doza te.

Tu dikarî dema binçavkirinê giliyê wan bikî.

Heke tu bixwazî dema binçavkirinê giliyê wan bikî, bixwaze bi lêpirsekî re yan jî bi yekî payebilindtir re biaxive.







Heke tu dixwazî piştî berdana xwe gilî bikî, tu dikarî herî rêveberiyeke polîsan.

Heke tu di dema girtinê de yan jî di binçavan de ji aliyê polîsekî ve hatibî êşandin yan jî te zirar dîtibe pêwîst e tu giliyê xwe li ba "Dezgeha Standardên Pîşeyî ya Îskoçyayê" bikî.




Ji bo gilîkirinê telefonî hejmara "101" bike yan jî here rêveberîya polîsan ya herêma xwe.

Tu dikarî her wisa ji hin kesên din bixwazî ku li ser navê te gilî bikin. Ev dikare hevjîn, hevalek yan jî kesekî din be ku baweriya te pê tê.

Pêwîst e tu destûra nivîskî bidiyê.

**Hilberandin li ser navê**

**SOLD Networkê**

**ji aliyê**

**People First (Scotland) ve**

**77-79 Easter Road,**

**Edinburgh,**

**EH7 5PW**

**0131 478 7707**

Şirketa bi garantiya bi hejmara 173180 û "Scottish Charity"a bi hejmara SC 026039 qeydkirî hatî sînordarkirin